

## Sersaxî

## Îsmet Şerîf Wanlî Ji Bîr Nabe

Bi êş û keser , bi dilên xemgîn , nûçeya koçbarkirina rewşenbîr û siyasetmedarê mezin Prof. Ismet Şerîf Wanlî gihabû me . Bila miletê Kurd sax be , dost , heval , meriv û malbata wî xweş bin .

**Ismet Şerîf** li dirêjahiya heftê salî , bêdudilî , bi hişmendî , bi dil û can , di ber doza netewî ya gelê xwe yê Kurd de dixebitî , .. Û ji ber rola wî ya balk

bêtirî carekê dihate ber kuştin

Ew ne tenê ligel yên

weke Dr. Kamîran

Bedirxan , pêşewa Mile

Mistefa Barzanî , Dr.

Qasimlo , Mûsa Enter ,

Osman Sebrî ,

Nûredîn Zaza , Dr. N.Dêrsimî , Hemreş Reşo û Reşîd Hemo têkildar bû , ew ligel bi sedan ji perlementê , rewşenbîr û siyasetmedarên Ewropî xwedî dostanî û têkliyên bi rêz bû .

**Ismet Şerîf** di nav Kurdan de , bi zanyarî û rewşenbîriya xwe , bi dilgermî û hişmendiya xwe , bi nivîsar û berhemên xwe yên akadîmîk bêhempa bû , û mirov dikare wî bide ber welatparêz û rewşenbîrê Filestînî Prof. Idward Se'îd û yê Firansî Alpêr Kamo .

**Ismet Şerîf** kurdhezekî aştxwaz , azadîxwaz û wekhevîxwaz bû .

Ew dê ji bîr ne be .

Em bejna xwe li ber wî ditewînin .

Bila hûn xweş bin .

Heleb 11.11.2011



## Heval Ebdurihman jî Barkir

Êvara 06-12-2011 an, li gundê Qujûma – herêma Kurdaxê, dilê Heval Ebdurihman Mistefa radiweste û ji nav me bardike. Roja dî bi beşdariya xewdî, gundî, dost û hevalên wî li goristana Qujûma tê veşartin û li ser gornê hevaleyê wî gotinekê li ser sinc , dilsozî û kurdperweriya wî ji berşedaran re dide xuyan.

Hêjayî gotinê ye, ku heval Ebdul-rhman ji destpêka salên 80î ve, derbasî nav refên tevgera



Kurd dibe û bi dilsozî û cangorî ta, dawiya jiyana xwe xebata xwe berdewam dike.

Bila serê xwedî, dost û hevalên wî saxbin.

## BirûskaSersaxiyê

Bi xemginiyeke bilind nûçeya kuştina rêberê gewre û Xebatkarê gelê Kurd Miş'el TEMO di nav gelê Kurd de belav bû. Ew kuştina reşkarî û çepel hêrseke mezin di dilê hemî lawên gelê Kurd û hezkiriyên azadiyê de rakir. Piştî ku sazûmana zordar û kufkî , nikanî bi gotinê, bi kuştina rêberan û bi wêrankirinê, serhildana xortên azadixwaz vemrandana, wê bawer kiriye ku ê bi kuştina rêberên hişyariya gel kanibe agirê şoreşa gelê Sûrî vemrîne. Lê belê, ji bîr kiriye, ku her dilopek ji xwîna her şehîdekî Sûrî, nemaze jî mirovên mîna nemir Miş'el TEMO, alafa agirê azadiyê hêgin û bilintir dike, û temenê sazûmana destbixwîn jî kintir

Bi navê kovara PIRS û rojnameya NEWROZ û xwendevanên wan, em teltîkêşên hov û destên ku di paş wan de , bi tundî



şermezar dikin. Bila serê gelê me û hemî dilxwazên azadiyê xweş be.